**Beşa Vekirî**
**DEMA SOSYOLOJÎYÊ**
*ji aliyê Komeleya Sosyolojiyê ya Navneteweyî*

Di demekê de ku serokên dewletan bawerîya xwe bi zanistê nayînin û êrîş li ser zanistên komelgehî zêde dibin;

Di demekê de ku nûçeyên derewîn ji analîzên li ser lêkolînan zêdetir belav dibin û bandorê dikin;

Di demekê de ku gelek serokên siyasî gotinên nefretê belav dikin û beşek ji gel ji mafê hemwelatîtiya tevîn bêpar dikin;

Di demekê de ku komên mirovan yekser ji mirovatiyê têne derxistin (dehumanization) û ev yek dîsa ji bo xurtkirina û domandina desthilatê dibe amûrekî berfireh;

Di demekê de ku daneyên zanistî tên redkirin ji bo ku krîzên jîngeh û civakî yên sîstematîk bêne înkar kirin;

Di demekê de ku dewletan kesên li dijî komkujî, tundûtûjiya sîstematîk û nijadperestiyê diaxivin, ditepisînin;

Di demekê de ku komkirina dewlemendiyeke bêhempa dihêle ku hejmarek hindik a zil-milyarderan komeleyên medyaya girseyî û medyaya civakî kontrol bikin;

Di demekê de ku mirovahî bi krîzên cîhanî re rû bi rû ye ya ku dê jiyana nifşên pêşerojê diyar bike;

Di demekê de ku azadiya akademîk heta di demokrasiyên kevnar de jî di bin metirsiyê de ye;
Em bawer dikin ku destwerdana rexneyî ya zanyarên civakî ji her demê girîngtir e.

Û em careke din ew nirx û peymanên ku wekî bingeh di xebata lêkolînerî, perwerdekarî û entelektueliya cîvakî ya me de ne, piştrast dikin.

Em van tiştan diparêzin:

- **Sosyolojiyeke rastgir** a ser bingeha rastiyan û analîzê; ku çîrokên hêsan red dike û tevliheviya cîhanê dipejirîne;
- **Sosyolojiyeke serbixwe** a ku tîne bîra me ku gotinên desthilatan ne her tim rast in, û derewek hezar carî jî were dubarekirin her dîsa derew e;
- **Sosyolojiyeke rexneyî** a ku li dijî zêdebûna newekheviyê derdikeve, mîta mirovê xwe-afirandî (Efsaneya ku dibêje mirov qaşo bi saya zîrektiya xwe ciyeke taybet ji xwe re çêkiriye), balkişandinên hêsan yên li ser bazar û xerckirinê û mêranîya "alpha" (Mêrê serdest) radiweste;
- **Sosyolojiyeke cemawerî** a ku beşdarê gotûbêjên civakî dibe, xwe ji kesi bilindtir nabîne, lê bi kesên ku dixwazin civakê biguherînin û qenciya hevpar biparêzin re diyalogê dike;
- **Sosyolojiyeke gelemper** a ku li hember xetereyên zêdepisporbûn û beş-beşbûna zêde radiweste û pirsgirêkên lezgîn ên demê digire ber xwe;
- **Sosyolojiyeke cîhanî** ku ji lêkolîner û aktorên civakî yên ji deverên cuda yên cîhanê fêr dibe ka meriv çawa pirsgirêkên sedsala 21'an fam bike û bersiva wan bide, û beşdarî avakirina hesteke mirovatî ya hevpar dibe.

**Beşa Vekirî**

"sosyolojî bûye amûrekî hetahetayî ji bo jiyaneke hevbeş a li gerstêrkeke sînordar"

Em bi awayekî xurt bawer dikin ku zanistên civakî û azadiya akademîk parçeyeke bingehîn a demokrasiyê ne û divê werin parastin û pêş xistin.

Em bawer dikin ku nîqaşa giştî ya agahdar, li ser bingeha dîrokê û girîngiya sosyolojîk ji bo têgihîştin û rêvebirina krîzên demê pir girîng e.

Em piştrast in ku sosyolojî ne tenê alîkariya me dike ku em cîhanê fam bikin, lê herwiha ji bo avakirina pêşerojeke dadperwer, jiyanbar, aştiyane û domdar jî dibe alîkar.

Di dema guherîna avhewayê, şer, zêdebûna newekheviyê û nefretê de, sosyolojî bûye amûrekî hetahetayî ji bo jiyaneke hevbeş a li gerstêrkeke sînordar.

Ev deklarasyon ji aliyê Serokê ISA Geoffrey Pleyers ve di 6'ê Tîrmeha 2025'an de li Foruma 5'emîn a Sosyolojiyê ya ISA li Rabatê hate pêşkeşkirin. Ji aliyê serokên berê yên ISA Sari Hanafi, Margaret Abraham û Michel Wieviorka; cîgirên serokên niha Allison Loconto, Bandana Purkayastha, Elina Oinas û Marta Soler; herwiha serokên komeleyên sosyolojiyê yên Ewropa û Amerîkaya Latîn û Serokê Konseya Zanistên Civakî ya Amerîkaya Latîn (CLACSO) Kaja Gadowska, Jesus Diaz û Pablo Vommaro ve tê piştgirîkirin.

**Rabat, Tîrmeh 2025**

Em têne pejirandinên kesane ji sosyologên kesane û ji endamên civaka zanistên civakî ya firehtir berhev dikin. Bi me re beşdar bibin bi lêzêdekirina navê xwe li vê daxuyaniya kolektîf a pabendbûn û piştgiriyê, bi dagirtina vê formê.